Rehendê Kurdistanî yê projeya Rojhilata Navîn a nû–2/2

Selah Bedredîn .....

Armanca me ji vê lêkolînê ne ravekirina nêrîna Amerîka anjî welatên din derbarê gelê kurd e, bi qasî ko ew pêşbînîkirina nêrînên lîstikvanên serekî di siyaseta Rojhilata Navîn de ye-nexasime Amerîka û Awropa ko xwediyên pêgehên aborî û leşkerî û siyasî yên ko maf didine wan ko ew jî tevî gelên navçê, wê bi rengekî dêmokiratîk ji nû ve form bikin û çarenûsa gelên wê destnîşan bikin û di nav de gelê kurd yê ku li ser çar dewletên bingehînî û bibandor hatiye parçekirin, û li benda pêkanîna van pêngavan e.

Pirsa ko li vir tê holê ev e, gelo kurd di proseya avakirina Rojhilata Navîn ya nû û acendeyên avakerên wê de, çi postî digirin?

Sebaretî faktorê herêmî, guman tê de nîn e ko hevpeymaneke berfireh di navbera hêzên millî rehqehîm û fermî yên tolerans ko daxwaza guherîna dêmokiratîk û çaksaziyê dikin de, ava dibe.Ev hevpeymana ku ji Iraqê destpê dike û li Filistînê radiweste û di Lubnanê de derbas dibe û di nav refên xwe de hêzên opozisyona nîştimanî di hemî welatên navçeyê de hembêz dike.Di vî warî de, dewletên weke Erebistana Saûdiyê û Misir û Urdun ê(hevpeymana dijayetîker)angu rêjîmên Sûrî û Îranê tevî rêxistinên islama siyasî yên tundrew û tayfeger û terorist-astenga serekî di riya bicihanîna proseya guherînê de, û dijminên herî mezin ji berjewendiyên xwe re dibînin.Bê guman, hêzên guherîna dêmokiratîk bi giştî destpê dikin ko nêrîneke saxlem ji gelê kurd û kêşeya wî ya dadmend bidin. Derbarê faktorê navneteweyî, em dê di vê nivîsara xwe de ji destpêkên qonaxa paş cenga sar û serkeftina Dewletên Yekbûyî yên Amerîka(DYA) destpê bikin, ev qonaxa ko bû destpêka vebûna Rojavayî ya giştî derbarê kêşeya kurd û berzbûna radeya girêdanê di navbera rewşa kurdî û ji holê rakirina rêjîmên totalîter û despotîk li Iraq û Îran û Sûriyê bi taybetî dema ko tê zanîn ko mijara Rojhilata Navîn a mezin û nû kurd û her çar dewlat û rêjîmên totalîter yên ku Kurdistan dabeşkirîne anjî di hevbendiya dijayetîker de ne vedihwîne, tevî berzbûna rastiyeke din ko hêzên kurdî yên siyasî li ku be bila bibe di rêza pêşîn de li hemberî despotism û terorê radiwestin, her weha di rêza pêşîn ya hêzên guherîna dêmokiratîk angu di nav refên eniya

navneteweyî ya aştîxwaz ko ji bo misogerkirina seqmagîrî û bicihanîna dad û mafan tê dikoşe de cî digirin, bi gotineke din gelê kurd beşekî aktîvane û sûdemend e di proseya jinûve avakirina Rojhilata Navîn ya nû de. Sîstêma cîhanî ya ko ji encama cenga cîhanî a diwemîn û misawemeyên herdû polan bû, bela anîne serê milletê Kurd hinde ko komara Mihabadê (1946) bû qurbana berjewendiyên navneteweyî û tevgera kurdî li Iraqê tûşî têkçûneke bijan di sala 1975 an piştî hevpeymana Cezayirê a ko misawemeyên navneteweyî li ser hisabê milletê kurd eşkere kir, hat.Di encamê de, doza kurdî di hemû welatên navçeyê de kete ber jibîrbûn û inkarkirinê de û dergehên cîhanê li Rojhilat û Rojava li pêşiya xebatkar û şerkerên azadiyê hatine girtin, û bêdengiyê civaka navdewletî vegirt derbarê qirkirina kurdan li Helebçeyê wekû mînak û kurd hatine êşkencekirin û ji hemû mafên xwe hatine bêparkirin û çalakgîrên wan hatine tunekirin li Tirkiyê û Îranê û koçbarkirin û bierebkirin li Îraqê û rastî zinara erebî li Sûriyê, hatin. Sîstêma cîhanî ya ko ji dema têkçûna pola sovêtî ve di deh salên dawî ji sedsala buhurî de hate damezirandin anuha di warê rastkirina çewtiyên rabirdû de ye û jinûve mêzandina li kurdan û doza wan di çarçoveya jinûve mêzandina di buneyadgeriya Rojhilata Navîn de bi giştî û nûkirina wê, li gor xwendin û têgihiştina bûyer û nêrîn û konevaniyên hanê:

Destpêka vebûna navneteweyî û danûsitendina erênî bi dosiyeya kurdî re di dema koça milyonî a kurdên Iraqê de hate xuyakirin û di proseya–provide comfort-ê de ji destpêka salên 90-î ji sedsala 20-an de bileş bû tevî hêza palpiştiya Amerîkî di kongirê aşîtiya Erebî-Israilî li Medrîd ê sala 1991 mîna balansekê di navbera kêşeyên bê çare li navçeyê, û radeya maytêkirina Amerîkî bi mebesta lihevanîna herdû hêzên kurdî ên serekî di kurdistana Iraqê de ya ko bi–peymana Waşîngtonê di 17-5-1998-an de, hate xemilandin.

Heta niha ti belgeyên ko nêrîna fermî ya dewletên Rojavayê derbarê mafên gelê kurd de destnîşan bike di destên me de nîn in, ji bilî nêrînên bilez û daxuyaniyên kurt derheqê hindek pirsgirêkên mirovî û bûyerên jinavçûyî.Di vî warî de, dipolmatê Amerîkî–Richard Donny-di axaftina xwe de di konferansa-kurd û gera li nasnamê-ya ko me îşaret pê dabû ji amadebûyan re wiha got:"hun dê daxuyaniyên taybet bi konevaniya hikûmeta Amerîkî derbarê milletê kurd de ji min nebihîzin, ji ber ko ew pêwîst nîn e û kurd lîstikvan in bê dewlet in û pêwendiyên wan ên navneteweyî biserketîtir in ji yên rêjîman".

Eşkere ye ko biryarder li Rojava bi giştî û li DYA–yê bi taybetî di warê birêvebirina wan ji siyaseta welatên wan re ewleyiyê bi zaniyarî û analîze û lêkolîn û pêşniyarên damûdezgehên istixbarat û zanistî û senterên vekolînên zanîngehan û serbixwe û pisporên siyasetê û stratîciyetê, ko beşeke giring ji mewdaniya budjeta neteweyî ya gitşî ji wan re tê parvekirin, tînin.Di vî biyavî de, sûdemend e eger ko em bijarteyan ji du raporên ko ramaneke baş sebaretî nêrîna Amerîkî derbarê kurdan di

çarçoveya Rojhilata Navîn ya nû de didin, bibîr bînin.Wisa dixuye ko ev rapor dê bibin bingeha konevaniya Amerîkî ya dûr û nêzîk di devera Rojhilata Navîn de:

Yekem:raporeke ji 32-rûpelan e pisporê Amerîkî ê stratîcîk–Pol Michel Fiby–ew pêşkêşî serok Boş kir–piştî gerekê li navçeyê li gel sisê pisporên din ji destpêka çileya paşîn /2001–an û naveroka rapora navhatî dikare di hindek xal û pêşniyaran de bête kurtkirin:gera li serkirdayetiyeke Filistîniya nû û dev ji bijarteya–Osloyê û bijarteyên leşkerî berdan, lêvegera di têkiliyên Amerîkî-Misirî de bi tenêhiştina rêjîmê, bihêzkirin û piştgirîkirina hevpeymana Israilî-Tirkî û tevlîkirina Urdunê, seriyê çaremîn di çargoşeya ko Fiby navê–Çargoşeya Hêzê-lê dike dê–Azerbaycan be ji ber ciyê wê yê ji Rûsiya û çavkaniyên petrol û xazê nêzîk û–Kurdistan–çimkî herêma Kurdistanê dergehê Iraq û îran û kendavê ye û ji seriyê çaremîn guherîna rêjîmên kevinare û bêhavil yên ko xeterekê derbarê berjewendiyên Amerîkayê de pêktînin destpê dike, û veguhastina Azerbaycan û kurdistana Iraqê bo bingeheke Amerîkiya leşkerî ya pêşketî û kirina kurdistanê kogeheke serbazî ji çekan re weke–Qeterê bi dilniyakirina hevalbendê Tirk.Fiby vî seriyê çaremîn mîna seriyê guherînê bilêv dike.Her weha, rapor banga bikaranîna hêzê bi armanca hilweşandina rêjîma Bexda û ya Tehranê dike tevî parçekirina Iraqê û danîna herêma kurdistanê li jêr birêvebiriyeke sivîl girêdayî rêxistina neteweyên yekbûyî bi maweyek intiqalî weke destpêka serxwebûnê li gor nimûneya–Tîmûra Rojhilat-û–herêma kosovayê-.

Ji aliyekî din ve, rapor banga derbeyek leşkerî ji bo pêkanîna guherînê li Sûdanê dike.

Sebaretî Sûriyê, rapor daxwaza vekolandina hebûna Sûrî li Lubnanê û banga xwe jêkişandinê û tenêhiştina rêjîmê ya herêmî dike, tev li avakirina pirojeyeke avê ko Tirkiyê avê bide Urdun û Israilê ji bo zêdekirina fişaran û gurkirina kendavê ko rêjîmê tenê bihêle û rapor di dawî de dibîne ko bicihanîna van pêşniyazan dê bi berzbûna Rojhilat Navîneke nû de, encam bide.Gelek sazî û alavan beşdarî di amadekirina raporê de kiriye weke:encûmena istixbaratên neteweyî Amerîkî a ko ji gelek saziyên ewlekarî pêktê, zanîngeha Maryland û instûta Botameek û zanîngeha George Town û Richard Hues ji saziya brokizê û pisporên Harvardê û dezgeha Karînîcî ya aşîtiyê li Waşîngtonê.

Diwemînm:raporeke ji 61-rûpelan ji aliyê CIA–ê ve di sala 2000-an de hate belavkirin û guh dide pêşdîtina pêşeroja cîhanê di 15 salên bê de weke rapora navhatî girêdayî Rojhilata Navîn û kurdan bi taybetî ye û reşbîn e derheqê çarenûsa girûpên tundrew. Herdû belgeyên ko birêz Richard Perl ew di sala 2002-an de pêşkêşkirin dema ko wî pêgeheke bilind di wezareta berevaniyê de digirt yek ji wan bi navê:"belgeya çareserkirina Iraqî"û ya din "belgeya ezmûna Iraqî"heman nêrîn û niyazên ko di herdû raporên navbirî de hatine tevî tekezkirina wî ji federasiyona kurdistanê re û pirsgirêka pirrengî û sekûlarizmê li Iraqê û veguhastina wê bo nimûneyekê

ji guherîna dêmokiratîk di hemî welatên deverê de di nav de yên hevbendên Amerîkayê jî. Jîngehên Rojavayî (Amerîkî û Awropî) di kokê de lihev dikin derbarê tewawbûna yetkiya sîstêma siyasiya kevin û pijirandina guherîna dêmokiratîk di Rojhilata Navîn de, heye ko di alavan de cida bin lê di perensîp û di destnîşankirina kirîze û rikeberiyên heyî yên nû û kevin yên qonaxa cenga sar, mîna:terora tundrew û rêjîmên totalîter û despotîk û çekên tevkuj û nakokiyên neteweyî û belengazî û biveyên qirkirina nijadperestî û nakokiyên mezhebî ko gefan li berjewendiyên hemû layan dixun de yek in, û bi piranî ew bi berpirsyariya xwe ya dîrokî hest dibin nexasime dewletên Awropî yên dagîrker derbarê beşeke mezin ji van kirîzên behskirî bi kêmasî ji dema hilweşandina împeratoriyeta Osmanî di dawiya cenga cîhaniya yekem de(1914-1918) û girêdana peymana Sayiks-Bîko û bicihanîna soz-peymana–Belford-û dabeşkirina kurdistanê û bipaşxistina îradeya xelkên wê di warê destnîşankirina çarenûsa xwe de.

Berevajî Awropiyan yên ko li riyên mandatekirin û dagîrkirin û dabeşkirina milletan digeriyan, Amerîka wê demê angu ji dema çardeh perensîpên Wilson (1916) piştgiriya perensîpa mafê neteweyên împeratoriyeta osmanî di destnîşankirina çarenûsa xwe de dikir û di nav de Kurd û piştî dor sedsalekê Amerîka siyaseta xwe jinûve ava dike û piştgiriya dozên millet û neteweyên ko heta niha bê par in di Rojhilata Navîn de dike, lê mixabin ko Awropa fermî hêjî dudil û bê çare ye ko nêrîna xwestî bigire lêbelê car bi car astengiyan jî zêde dike li hemberî kiryara Amerîkî weke ko li Iraqê pêkhat ji ber hindek sedemên berjewendîperest û teng berevajî nêrînên erênî yên raya gitşî ya welatên Awropa tevî rojnamegerî û tevgerên civaka sivîl û dezgehên perlemanî. Di dawî de, pêwîst e ko em Rojhilata Navîn bi tavilê reng û formên wê-ku em Kurd beşekî bingehînî jê ne-berev guherînên kûr ve, dimeşe, û hêjî proseya guherînê lidar e û şiyan tev-erênî û neyênî-li pêş çavan in, û di rewşên wisa de stûbariyên herî giran dikevine ser milê elîtên milletan yên siyasî û ramanî û rewşenbîrî û di nav de milletê kurd da ko pêşdîtina asoyên paşerojê bikin û bi rastiyane nêrînên cida bixwînin û riyên pêkanîna bidestkeftiyan dabîn bikin û berjewendiyên niştimanî û neteweyî biparêzin û astengî û biveyan destnîşan bikin û alternatîvan pêşkêş bikin, eger hat û ev çêbû kurd dê beşekî serekî bin di hevsenga avakirina Rojhilata Navîn ya Nû de û dê beşdarî pêkanîna aşîtî û demokirasiyê bibin û paşerojeke şayiste ji bo xwe misoger bikin.